# Lênihêrîna navnivîsandinê li dibistanê

## Zanyariyên têkildarî lênihêrîna bijîşkî di destpêka perwerdehiyê li dibistanê

Dêûbavên hêja, serperestên hêja,

Gișt zarok divê salekê beriya destpêbûna pêwîstiya wergirtina perwerdeyê li dibistanê ji aliyê bijîşkê dibistanê va werin lênihêrandin û miayînekirin. Ev yek her wiha derbarê zarokên ku beriya demê û bi awayê pêşwext li dibistanê dihêne tomarkirin û wek Kann-Kinder dihêne binavkirin, derbasdar e. Zarokên ku salekê ji perwerdeya dibistanê hatine miafkirin, divê dîsan beşdarî lênihêrîna bijîşkê dibistanê bibin.

Ev lênihêrîn wek lênihêrîna bijîşkî ya navnivîsandina li dibistanê tê zanîn û li gorî qanûnî mecbûrî ye (Xala 26a ji Qanûna Dibistanan a Sachsen'ê).

Herî kêm kesekî xwedî mafê serperestiyê divê dema lênihêrînê amade be. Lênihêrîn derdora 40 deqeyî dem dibe.

### Çi dihê lênihêrandin û miayînekirin?

Bijîşkên dibistanê yên Xizmetên Bijîşka Zarok û Nûciwanan dixwazin ku van babetên xwarê bizanin:

- Gelo têkildarî zarokê we astengiyên têkildarî tenduristiyê û taymendiyên mezinbûnê hene ku muhtemel e ji bo perwerdeya li dibistanê giring bin,
- Gelo zarokê we bi awayekî taybet dihê piştgirîkirin an dermankirinek tê pêşniyazkirin.

Babetên xwarê dihêne nirxandin:

- bînahî û bihîstin,
- Giraniya bedenê û bejn,
- Pisporiya pêkanîna tevgerên nazik û tevgerên giştî û her wiha
- Pêşketina zimanî û nasbarî.

Rewşa vaksînekirina zarokê we jî dihê tomarkirin.

Bijîşk lênihêrînê hevrê digel we dinirxîne û bersiva pirsên we dide. Hûn ê encama lênihêrînê bi awayê nivîskî jî wergirin.

Ji kerema xwe bila haya we jê hebe ku rêveberiya dibistanê li ser navnivîsandina li dibistanê biryar dide. Xizmetên Bijîşka Zarok û Nûciwanan tenê hin pêşniyaz û şîretan raber dike. Der bareyê encamên lênihêrînên têkildarî dibistanê, dibistan dê were agehdarkirin.

### Lênihêrîn kengî pêk tê û çawa divê demeke serlêdanê were hevahengkirin?

Lênihêrînên navnivîsandina li dibistanê di sala beriya navnivîsandina li dibistanê diheyama demê ya ji Tebax heta Çileyê pêk tên.

Hûn dikarin randevû anku dema serlêdanê ji bo lênihêrîna navnivîsandina li dibistanê bi awayê serhêl an bi rêya telefonê hevaheng bikin.

Salekê beriya navnivîsandina li dibistanê (derdora meha Tebaxê) yhûn ê daxwazeke nivîskî ji bo navnivîsandina zarokê xwe li dibistanê ji Rêveberiya Dibistanan (Amt für Schulen) wergirin. Di vê nameyê da hûn ê van babetan bibînin:

- Zanyariyên têkidlarî lênihêrîna navnivîsandina li dibistanê,
- Lînka têkildarî pergala reservasyona randevûyê ya serhêl û her wiha
- Hejmara telefona Xizmetên Bijîşka Zarok û Nûciwanan a têkildarî xwe ji bo veqetandina randevûyeke telefonî.

Eger we nameyek ji Rêveberiya Dibistanan wernegirtiye, dikarin di rewşa daxwazê da randevûyekê bi rêya telefona xwarê hevaheng bikin: (03 51) 4 88 82 41.

### Lênihêrîn li ku derê bi cih tê?

Lênihêrîna navnivîsandina li dibistanê li Rêveberiyeke Xizmetên Bijîşka Zarok û Nûciwanan (KJÄD) bi cih tê. Warê berpirsyariyê têkildarî wê dibistana seretayî ye ku hûn zarokê xwe lê tomar dikin. Çar rêveberiyên xwarê hene:

- KJÄD Mitte: Haus des Kindes,
  Dürerstraße 88, 01307 Dresden
- KJÄD West: Braunsdorfer Straße 13, 01159 Dresden
- KJÄD Süd: Albert-Wolf-Platz 4, 01239 Dresden
- KJÄD Nord: Bautzner Straße 125, 01099 Dresden

Ji kerema xwe wergerîne →

## Çi belge divê hevrê digel xwe bînin?

Ji kerema xwe di roja lênihêrînê da belgeyên xwarê hevrê digel xwe bînin:

- Pirsnameya dêbavan a dagirtî (hûn wê di dema wergirtina randevûya serhêl/online an di rûpela me ya sereke da ku li xwarê hatiye destnîşankirin, werdigirn. Her wiha di rojên navnivîsandina li dibistanê da hûn dikarin vê formê ji dibistana seretayî wergirin.),
- lênûska lênihêrînên pêşîlêgirtinê ya zer, eger hewce be encamên lêbihêrînan û belgeyên bijîşkî û her wiha
- Karta vaksînasyonê (jibo dîtinê, tomarkirna vaksînasyonê û şêwirînê).

Nasyariya digel we û zarokê we di dema lênihêrîna navnivîsandina li dibistanê dê me kêfxweş bike.

Têkildarî pirsan dikarî eger bixwazî seredana me bikî, digel me têkilî dayînî yan nameyekê binivîsî. - Xizmetên Bijîşka Zarok û Nûciwanan a we.

## Têkilî


Landeshauptstadt Dresden
Amt für Gesundheit und Prävention
Kinder- und Jugendärztlicher Dienst
Dürerstraße 88, 01307 Dresden

Telefon: (03 51) 4 88 82 41
E-Mail: gesundheitsamt-kjg@dresden.de

→ dresden.de/schulaufnahmeuntersuchung
→ dresden.de/kindergesundheit

Weşîner: Landeshauptstadt Dresden, Amt für Gesundheit und Prävention, Amt für Presse-, Öffentlichkeitsarbeit und Protokoll, Gulana 2024an